Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar :1176 9-Pûşper-2024 www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ nameronahi@gmail.com 423165

Ji çîrokên dapîra xwe du berhemên bi wate amade kir

Zîlan Hemo nivîsandina çîrokên dapîra xwe li ser xwe weke erkekê dît û du berhem jê afirand.
Li Kantona Firatê di 3'yê Sibatê de ahenga îmzekirina 5 pirtûkan hate lidarxistin. Pirtûka nivîskar Zîlan Hemo ya bi navê ''Bi Şevê Tên Gotin'' jî di nava pirtûkan de cih girt ku pirtûka nîvîskarê ya duyem e. Zîlan Hemoyê derbarê îmzekirina pirtûka xwe de ya ku wê ev berhem ji dapîra xwe girtiye got.
Nivîskar Zîlan Hemo got ku min girîngî bi wê yekê didît ku em xwedî li folklor û çîrokên xwe yên gelêrî derkevin. Çîrok in ku di navbera roja me û dîrokê de girêdanekê pêk tînin û got: "Ev pirtûka min a duyem e ku min berhev kiriye. Min di nivîsandina gelek pirtûkên hevbeş de cih girt ku yek ji wan jî pirtûka bi navê ''Çirûskek Ji Berxwedaniya Kobanê'' ye ku 10 nivîskaran bi hev re ev berhem amade kir. Her wiha pirtûka bi navê ''Rodî û Perwîn'' jî me berhev kir. Ji bilî van her du pirtûkan, pirtûka min a yekem a bi navê ''Bi Roj Nayên Gotin'' e ku ev pirtûk jî yek ji pirtûkên çîrokên gelêrî ye. Ev pirtûka min a duyem a bi navê ''Bi Şev Tên Gotin'' jî weke berdewamiya pirtûka min a yekem e" Zîlan Hemoyê di berdewamiya axaftina xwe de got: "Cara yekem min di sala 2014'an de piştî ku min

dest bi xwendina zimanê kurdî kir, min dest bi xwendina pirtûkan jî kir, piştre jî min dest bi nivîsandinê kir. Dema ku em di dersên folklorê de li ser mijara girîngî û berhevkirina berhemên gelêrî rawestiyan, min ew yek hîs kir ku divê em xwedî li folklora xwe derkevin."

Bi rojê nayên gotin bi şevê tên gotin

Zîlan Hemo diyar kir ku wê berhemên xwe bi giştî ji dapîra xwe girtine û ev yek wiha anî ziman: "Me şer, komkujî û êrîşên gelekî dijwar dîtin, heya ku em neçar man em koç bikin. Van karesatan jî bandoreke mezin li derûniya min kir ku min nekarî ez nivîsandinê berdewam bikim lê belê piştî demekê min dîsa dest bi nivîsandina çîrokan kir. Li rastî gelek astengiyan hatim lê belê dîsa jî min nivîsandina pirtûka xwe berdewam kir û gihand xwendekaran."
Zîlanê got ku dema me dersên folklorê digirt di dersê de qala çîrokên ku dapîra min di zarokatiya min de ji min re digot, dihat kirin. Vê yekê gelekî bandor li min kir û min nivîsandina wan çîrokan ji bo xwe weke erkekê dît û Zîlan Hemoyê axaftina xwe wiha domand:"Di dersên folklorê de hemû caran heman tişt dihat bîra min, ew jî zarokatiya min bû ku di sarmaya zivistanan de dapîr û bapîrê min bi şevê li ber çirayê û sobeyê ji me re çîrok digotin. Gava ez zarok bapîrê min wefat kir, lê belê dapîra min ji min re her tim çîrok digotin.Ez bi wê yekê gelekî kêfxweş dibûm. Dapîra min piştî hemû çîrokên xwe jî weke pendekê şîret li me dikir. Carna me bi roj jê dixwest ku ji me re çîrokan vebêje, wê jî digot; 'Bi roj nayê gotin, bi şevê tên gotin.'
Zîlanê anî ziman ku divê ew xwedî li wan kesên temenmezin derkevin ku li gel wan bi hezaran çîrok, gotinên pêşiyan û pend hene û divê wan pirtûkan jî ji xwendekaran û nifşê nû re diyar bikin û ev yek anîn ziman: "Em roj bi roj ew kesên ku weke pirekê di navbera dîrok û roja me ya îroyîn de ne ji dest didin. Ew zanist û gotin, pend, çîrok jî bi wan re dimirin. Divê em ji bo vê yekê zêdetir hewl bidin da ku em bikaribin çîrokên xwe yên gelêrî û folklora xwe zêdetir pêş bixin. Hewce ye beriya wefata wan em ew tiştên ku ew dizanin em tomar bikin û

wan weke pirtûk binivîsînin. Ez bi xwe gelekî bi şans hîs dikim ku min karî ez ji dapîra xwe wan çîrokên gelêrî tomar bikin û wan weke pirtûk biweşînim."
Zîlanê got ku ew ne tenê çîrokan dinivîse di heman demê de ew roman û helbestan jî dinivîse, lê belê ew nivîsandina çîrokan li ser xwe weke erkekê dibîne ku divê ew wê yekê pêk bîne û wiha axivî: "Her tim metirsiya wefata kesên ku çîrokan, mamikan, dengbêjî û destanan dibêjin, li gel min heye. Ez jî nivîsaninda wan li ser xwe weke erkekê dibînim. Tu kes heta hetayê najî lê belê divê em li wêje û dîroka xwe xwedî derkevin. Ez dizanim ku em nikarin hemûyan tomar bikin, berhev bikin û binivîsin lê belê bi qasî ji destê me tê em dê ji bo vê yekê hewl bidin da ku em bikaribin wêjeya xwe pêş bixin."
Zîlan Hemo di dawiyê de got ku divê her kesê ku dengê ew kesên temenmezin tomar bike û piştre jî wan binivîse û Zîlanê axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Kêfxweşiyeke mezin e ku nifşê nû bi zimanê xwe hebûna xwe îfade bike. Ji vî nifşî jî wê gelek nivîskar jê derkevin. Bi vî awayî wê zimanê kurdî û wêjeya wê jî pêş bikeve. Min heya niha bi tenê 52 çîrok ji dapîra xwe wergirtine. Lê belê dema ez kesên temenmezin dibînim, hema kurtejiyana wan, serpêhatî û zanînên wan ên gelêrî berhev dikim û wan dinivîsim."

Li Awûstralya 160 balîna xwe li peravê dan

Navenda Nûçeyan

Li eyaleta Awûstralya Rojava ya Awûstralyayê, nêzî 160 balînayê ku li ber peravê ketin 26 balîna mirin.
Wezareta Navendên Cîhrengî, Parastin û Cazîbeyê (DBCA) ya eyaletê der barê baliyên ku li ber perava Toby's Inlet a li rojavayê Awustralya ya Awûstralyayê ketin de daxuyaniyek da.
Di daxuyaniyê de hate diyarkirin ku ji nêzî 160 baliyên ku li perava Toby's Inlet a li nêzî bajarê turîstîk Dunsborough ketin, 26 balîna beriya destpêkirina xebatên lêgerîn û rizgarkirinê ya 'jiyana kûvî' ya ji zanyarên derya û beytaran pêkt ê, mirin. Berpirsyara 'Jiyana kûvî' a herêmê Pîa Courtîs, da zanîn balîna îro saetên zû li ber peravê ketine û wiha got: "Mixabin dema balînayên me yên pîlot li peravê dikevin, encam baş nabe. Gelek ajalên me yên di dawiyê de dimirin hene."
Rayedarên ku texmîn dikin, peravên bi qûm ên kêm meyldar, balînayan şaş dike û dibe sedema li ber ketina peravê û diyar kirin ku qerebalixa mirovan a bin deryayê jî dîtina rêya rast a balînayan asteng dike.

bi kamîreya ronahî

FERHENGA BIWÊJAN

Negot lam û cîm:
- Deng jê derneket; newêriya dengê xwe bike.
Netirse ji ava pêlpêlok, bitirse ji ya nermnermok:
- Ji kesê dike qîreqîr netirse, ji kesê bêdeng bitirse.
Newêre bêje kişe mêşê:
- Pir jê ditirse.
Newêrin serên xwe rakin:
- Pir ditirsin; zordarî pir li wan tê kirin.
Poçik ketiye nav lingan:
- Tirsiyaye; ji kêr ketiye; berîşan bûye.
Poçika wî ketiye qûnê:
- Bi heman wateyê.
Pora min bû şûjin:
- Ez pir tirsiyam; ez bizdiyam.
Pora serê min rabû:
- Bi heman wateyê.
Qûnşil bû:
- Fikar jê re çêbûn; tirsiya; guman jê re çêbûn.
Qileqil pê ketiye:
- Ketiye kelecanê; tiştin bihîstine; ditirse.
Qûneqûnî dibe:
- Dipelike; ditirse.
Rimekê çeng bû:
- Pir tirsiya.
Ruhşîrîn e:
- Dema yek xwe nade ciyekî bixeter hingê tê gotin.
Rûvî rê revî, rê rûvî revî.
- Her du ji hev tirsiyan.
Siha me ji berî me dibeziya:
- Em pir ditirsiyan; em bizdiyabûn.
Tevizî:
- Tirsiya.
Tevizand:
- Tirsand.
Tirsa mirinê ketiye dilê wî:
- Pir ditirse; ji tirsa êdî nizane ka çawa bike; ziravê wî qetiyaye.
Tirs mergê rûvî ye:
- Dema yek ji tirsa dev ji tiştekî berdide hingê tê gotin.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

Li hemberî hêza jinê; Şerê Taybet

Hêzên desthiladar û kapîtalîzmê jin xistine rewşa amûrek zarokanîn û xizmeta xwe de. Ev hişmendî û ferasetên

kaptalîzmê yên li dijî jinê ye. Ji vê jî diyar dibe ku pergala mêrdewletê li gor berjewendiyên xwe zagonan ji jiyana jinê re datîne û hesaban li ser bedena wê dike.**R-2**

Çalakiya Dîlên Azadiyê bi biryardariyeke mezin berdewam e

Çalakiya girtiyên azadiyên yên di girtîgehên Bakurê Kurdistan û Tirkiyê de ya boykotkirina hevdîtinên ser telefonê û derketina dadgehê di roja 196'an de bi biryardariyeke mezin didome.**R-3**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar : 1176 9-Pûşper-2024 www.ronahi.net/ku/ Nirx: 500 L.S

PERGALA ÎMRALIYÊ PERGALA QIRKIRINA GELAN E

Rêberê Gelan Abdullah Ocalan derbarê Îmraliyê de wiha dibêje: "Girtîgeha Îmraliyê ji pergala girtîgehên li Tirkiyeyê gelekî cuda ye. Rewşa li hemû girtîgehên din yên heyî li vir derbas nabe. Rewş û avahiya vê derê bi peymaneke veşartî hatiye avakirin. Amerîkayê girtîgehên bi vî rengî bi peymanên veşartî li gelek deverên din jî dan çêkirin. Girtîgeha Îmraliyê jî bi alîkariya Amerîka û Tirkiyeyê bi hev re bi awayekî veşartî amade kirin".R-4

'Bi bilindkirina asta berxwedanê wê êrîş têk biçin'

Hevseroka Tevgera Civaka Demokratîk (TEV-DEM) Rûken Ehmed bang li tevahî gelên herêmê kir ku bi yek helwest, bi sekn û hevgirtineke xurt li hemberî êrîşên dagirkeriya Tirk berxwedanê bighînin lûtkeyê.**R-5**

Rastiya Rojê li Rojhilatê Asyayê... Beşa (3)

Bê guman hemû şaristaniyên mirovatiyê ji hev bi bandor dibe. Ango di şaristiyên destpêkê hata roja me ya îro de dan û stendin di navbera şaristanî û modernînteyên cîhanê ji hev qût nebûne.**R-6**

Sînema bi vîna hezkiriyên wê hat vejandin

KOMÎNA FÎLM A ROJAVA

Endama Komîna Fîlm A Rojava Nadiya Derwêş diyar kir ku Komîna Fîlm A Rojava di 14'ê Tîrmeha sala 2015'an de, bi kombûna sînemager û hezkiriyên sînemayê yên li welat û derveyî welat hat avakirin û di warê sînemayê de serkeftinên mezin qezenc kir.**R-7**

Dengê Min Tê Te
Sîpan Şînda R-7

Li hemberî hêza jinê; Şerê Taybet

Hêzên desthiladar û kapîtalîzmê jin xistine rewşa amûrek zarok anîn û xizmeta xwe de. Ev hişmendî û ferasetên kaptalîzmê yên li dijî jinê ye. Ji vê jî diyar dibe ku pergala mêr-dewletê li gor berjewendiyên xwe zagonan ji jiyana jinê re datîne û hesaban li ser bedena wê dike.

Birûc Resûl/Qamişlo

Jin û ciwan stûnên herî bingehîn yên civakê ne, beşên herî aktîv in, enerjîk û bi bandor in, lewra heger ev herdu beş bên dîlgirtin, ev tê weteya ku civak bi giştî tê dîlgirtin. Sîstema Dewletê civak xistiye nava çerxa kapîtalîzmê û dizivirîne. Di bin navê azadî û modêrnîteyê de herkesî dadiqurtîne hindirê xwe, mejî û ruhê herkesî kiriye milkê xwe. Xwe ji herkesî re mîna pêşkêşvanê azadiyê nîşan dide. Kesayeta jinê ji xwebûna wê derxistiye.



Li gorî desthilatdaran jin di civakê de wekî mirovan nayê dîtin

Ciwanên ku xwedî taqeta avakirin û herkîna civakê ne, îro ew kirine mîna amûrekî ji bo xirabkirin û hilweşandina civakê. Jin a ku weke nîvê civakê tê zanîn û di pêşengî û avakirina civakê de xwedî roleke girîng e, lê di roja îro de rola wê bi temamî hatiye berûvajîkirin. Gelek ziyanên ku îro di civakê de tênê çêkirin pergala deshilatdar bi destê jinê dide avakirin. Ji xwe jin jî ne di zanebûna van kiryaran de ye. Bi rengekî bê zanebûn xizmeta zilamê deshilatdar dike, bi vî rengî ew dikeve rewşeke guneh û bêçar e. Bi siyaseteke pir zirav û qirêj ew tê kirîn û firotin. Li ser bedena wê bazar tê kirin, li ser cewher wê leyîstok tên meşandin, her deqe vîna wê tê şkestin, dîroka wê ya xwedawendiyê, berhemên wê yên hezar salan tênê înkarkirin, lê tevî vê yekê jî pergal ji bo bercewendiyên xwe hertim wê wekî ya herî baş û azad nîşan dide. Bê guman ev xapandine, ev rewş bi jinê jî daye heskirin û pejirandin, jin jî bi rewşa xwe ya heyî razî ye, tevî ku ew di nava civakê de weke mirov nayê dîtin.

Jin xistine rewşa makîneya zarok anîn û xizmeta xwe de

Sîstema dewletê mijara cinsî pir zêde daye pêş. Ew ji fonkisyona wê ya biyolojîk a berdewamkirina cins bi dûr xistiye, berûvajî kiriye û di qada civakî - siyasî de vegerandiya fonkisiyona belavbûn û zêdebûna bê sînor a serweriya deshilatdariya mêr. Jin xistine rewşa makîneya zarok anîn û xizmetê. Ev e hişmendî û çemkên kaptalîzmê yên li dijî jinê. Ji vê jî diyar dibe ku pergala dewletê li gor berjewendiyên xwe zagonan ji jiyana jinê re datîne û hesaban li ser bedena wê dike.

Firotina jinan

Di serdema koledariyê de jin li mazatan dihate kirîn û difirotin, yê dihat ku bikire destpêkê hemû bedena wê di kontrolê re derbas dikir. ji têlên porên wê hetanî neynokên nigê wê, da ku bizane ka saxleme yan na ku bikaribe daxwazên xweda qiral bi cih bîne. Li gora wê her parçeyek ji bedena wê buhayek li ser dihate danîn.

Pîvan bûye pîvana hişmendiya kepîtalîzimê

Di roja me ya îro de jî heman tişt li ser jinê tê kirin, lê bi şêwazekî hîn zirav û mûdêrin. Îro her maleke bûye mezat. Ji bo keçekê bidin zewicandin malbat û xizimên zilam û jinê li hev dicivin û bi demjimêran li ser buhayê wê jinê guftûgoyan pêşdixin. Gelo ew hêjaye çiqasî ye? Ew çiqas kar û himaliyê dike? Ew çiqas bedew e? Bi temenê xwe biçûk e yan na? û …hwd. Li gor van rewşan pere ji malbata wê re tên dayîn lê kes napisre ew çiqas zana û têgihiştî ye. Ji bo wan ya girîng reng û şemal e. Ji ber şekil bûye pîvana bingehîn ya serdema niha. Pîvan bûye pîvana hişmendiya kepîtalîzimê, nasnama mirovan fîzîka mirovan e, mirov bi nasnama xwe ya bîrdozî nayên naskirin, ew bi şekil tên nasîn. Lewra her jinek di nava lêgerîna xweşikbûnê de ye, her diçe ew ji xwezayîbûna xwe dûr dikeve. Êdî bi dil û xwesteka xwe, xwe pêşkêş dike û bi zincîrên koletiyê girêdide, yanî qefesa xwe bi destê xwe dide çêkirin.

Di bin navê kar de, jin fêrî jiyan erebêsk û fihûşê dikin

Civaka ku bi sedsalan di nava qalibên fewdal û doxman de hatibû fetisandin, di bin navê azadî, maf û modêrnîtayê de, civak bi temamî ji cewher, axlaq û civakbûnê derxistiye, ji bo civakek li gora bercewendiyên xwe bide sazkirin amûrên şerê teybet yên wekî cins, spor û senat dide pêş, bi rêya raghandin û dibistanan naveroka wan pûç kiriye. Ji bo avakirina welatiyên efyonkêş yên herî ehmeq û rezîl medya kaptalîzmê bi roleke sereke radibe. Mînaka vê em rojane dibînin. Rêzefîlmên ku her roj bi rêya televizyonan tênê weşandin ji naveroka wan diyar dibe kolekirina jinê tê armanckirin. Eger mirov bala xwe bide wan rêzfilman, mirovê bibîne ku hertim rolên xirab dikin para jinê, mîna ku hertim sedema pirsgirêkan be, bêçar e, xeydokî, girî, bi bikaranîna bedena xwe, zilam ji rê derdixe… hwd, di hişmendiya mirovan de jina bi vî şêwazî dide pênasekirin, bi vî rengî bêbextî û xeyaneta herî mezin li ked û cewhera jinê dike. Kurt û kurmancî, jina ku ew dixwaze hildibijêre û dide pêş. Ji milekî ve bi bedena wê herkesî dikşîne nava qefesa xwe, dike êsirê hişmendiya xwe, ji milê din ve jî, wê rezîl, fahîşe û ketî nîşan dide. Herdu rolên ku jê re dane diyarkirin, di encamê de heman tişt in. Jin ji cewhera wê ya jintiyê qutkiriye û wê wekî cinsê herî ketî daye nîşandan, di heman demê de li kêlek vê, jinê teşwîqî van karên qirêj dike. Bi her rengî jin tê bikaranîn. Firoşkar piranî jin in, ji bo ku him wê teşwîqî madiyetê bike û him jî derdor bikêşîne. Di kargehan de piranî jinên ciwan kar dikin, di bin navê kar de, di wan ciyan de, wan fêrî jiyan erebêsk û fihûşê dikin. Xaleke din ya ku dewleta Tirk wekî şerê teybet li hember jinê bi kar tîne, musulmantî ye.

Dibêjin pêwîste jin gotina zilam neşkîne da ku ew biçe buheştê

Heta îslam jî li gora berjewendiyên xwe dane guhertin û di bin navê îslamê de çi xirabiya heyî tînin serê jinê. Wekî din rêbazên ku di bin navê îslamê de weke zagon hatine binavkirin bi armanca kolekirina civakê ne, wekî zagona nîzama 12'ê Îlonê ya ku dibêje: "Pêwîste keç berya bigihêje pazdeh saliya xwe bizewice, ji ber ku guneh e." Gelo armanca vê zagonê çi bû? Çima di temenekî biçûk de zewicandin? Bê guman armanca wê şkandina vîna jinê ye, civakek xav avakirine, pirsgirêkên civakê kûr kirin û pir kirine, deshilatiya zilam mezinkirin û xurtkirine. Jinek nûgihayî dê zarokên çawa mezin bike û li ser kîjan pîvanan perwerde bike? Bê guman ew ê kesayetek binkeftî, bi pirsgirêk û li gor daxwaza pargalê ava bike. Bila jin baxive lê di sînorekî de baxive, karê ne yê wê be bila nêzî nebe, li hember zilam dengê xwe neke, yanî li hember dewletê dengê xwe neke, gotina zilam neşkîne ji bo ku ew biçe buheştê, ev tê wê weteyê ku nabe ti kes gotina dewletê bişkîne.

Ku şer li hemberê şerê taybet nîn be, wê civak bibe goristana miriyan

Heman vî şerê teybet bi polîtîkayek pir zirav li hember ciwanan jî dide meşandin. Dewlet bi giştî di dibistanan de vê polîtîkeyê bi rê ve dibe. Lîberalîzimê weke dersên sereke dide pêş, di bin navê azadiya kesayetî de ciwanan teşwîqî jiyana bi tenê û ezezîtiyê dike. ji bo civakê azadiyeke bi vî rengî pênase dike û dixwaze bi vî şêwazî wî ji civakbûnê qut bike. ji xwe armanc jê ew e ku ruhê civakbûnê nehêle. Dibistanên bi peran û bê pere jî hene, dibistanên ku teybet tên dîtin nabin para herkesî. Bi armanca mejiyê ciwanan bişûn û bê hiş bihêlin ciwanan teşwîqî kişandina madeyên hişber dikin, teşwîqî fihûşê dikin. Armanca dewletên destheledar ji vî şerê teybet yê ku dide meşandin ku ciwanan ji rihê xwe yê dînamîk dûr bixîne. Wî ji hestên welatparêziyê ziwa bike û di paşerojê de serê xwe li hember zulm û hovîtiya dewletê raneke. Vê yekê dike, tenê ji bo ku hêza ciwanan bike bin xizmeta desthilatdariya xwe. Vî şerê teybet mêjiyê civakê xwariye, heta ku ev politîkeya şerê teybet û armancên ku têne meşandin, neyê dîtin û fêmkirin, wê civak bibe mîna goristana miriyan.

Tekoşîna azadiya jinê

Bi taybetî di pêvajoyekî bi vê rengî de ku Têkoşîna Azadiya Jinê astekî girîng bidestxistiye, di hemû qadên têkoşînê de tevlîbûnek pir mezin heye û pêşengtiya jinê heye, di gel û civakên cûda de jinan bandor dike de ewqas di lûtkeyê de be, wê demê pêwiste mirov birûne û hîn kûrtir bifikre. Bi taybetî jî dema li ber çavan tê girtin ku yek ji lingên paradîgmaya azadiya jinê ye, perspektîfa modernîteya demokratîk azadiya jinê û civakek li derdora jinê ye; wê hîn baştir were fêmkirin ku sepanên bi vê rengê di bingehîn de birdozî û armancên Tevgera me ya Azadiyê armanc dike. Zanista jinê, têkoşîna jinê, vejîna jinê û berxwedana jinê her ku mezin dibe û bilind dibe, her ku di nav refên azadiyê de pêşengtiya jinê roj bi roj bihêztir dibe û pêş de diçe, asta sepanên bi vê rengê jî hîn kûrtir dibe.

Sînema bi vîna hezkiriyên wê hat vejandin

Endama Komîna Fîlm A Rojava Nadiya Derwêş diyar kir ku Komîna Fîlm A Rojava di 14'ê Tîrmeha sala 2015'an de, bi kombûna sînemager û hezkiriyên sînemayê li welat û derveyî welat ev komîn hat avakirin.

Berçem Silêman/ Qamişlo

Di derbarê kar û xebatên sînema ji roja avabûna wê heya roja îro Endama Komîna Film A Rojava Nadiya Derwêş bersiva pirsên Rojnameya me dan, hevpeyvîn wiha bû:

-Xebatên sînemayê li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji destpêka Şoreşa 19'ê Tîrmehê ve heyanî niha, çawa bi rêve diçe, gihaye çi astê û astengî çine?

Dema berê de filmên ku hebûn û dihatin pêşkêş kirin ji bo kurdan nedibûn bersiv, ji ber ne bizamanê mebû û ne jî çîrokên me digotin. Lê piştî dest pêkirina Şoreşa 19'ê Tîrmehê, yek ji aliyên wê ya herî bi hêz aliyê dîtbarî bû bi taybet di milê huner û sînema de, ji ber vê yekê di nava Şoreşê de piştî ku sînema hat avakirin, ji nû ve kurd karîn bi ziman û hebûna xwe filmên xwe çêbikin, gavên destpêkê yên avakirina komîna film li ser esasê belavkirina çanda sînema bû, da ku bibe parçeyek ji jiyana rojane ya mirovan. Gava destpêkê ku me da pêşiya xwe nîşandana filiman bû, ji ber ku armanca me ya sereke ku milet fêrî çanda temaşekirina filman bibin. Li seranserî hemû bajaran û gundan filimê destpêkê ji bo zarokan hat bêşkêş kirin, ew filim bi navê Çalîçaplê bû, zarok jî bi kelecaneke mezin tevlî vî filmî bûn. Ji ber ku ev filim wek gava yekê bû û tiştekî nû bû. Herwiha ji bo wan wek hesretekî bû ku cihekî sînema hebê û li filman temaşe bikin. Di heman demê de ev sînema ne tenê ji bo kurda ye, ji ber navê wê sînemaya şoreşgeriye, hemû netew jî di nav de cihê xwe digrin. di sala 2015'an de gelek kar û xebat hatin pêşxistin, gava destpêkê nîşandana filman bû û bi taybet ji bo zarokan bû, lê jê û şûnde me xwest wek çandek were avakirin. Herwiha armanca me ya duyemîn avakirin û perwerdekirina sînemagera ye, heta ku em bikaribin filmê xwe çêbikin pêwîstî bi xebatkaran heye. Armanca me ya siyemîn jî çêkirina filma ye.

Ji destpêka sala 2015'an ve heya niha gelek fîlim, belgefilim û kurtefilim hatin çêkirin, belgefilmê destpêkê hatî çêkirin ji bo zarokan bû bi navê "Zarokin Em" gava destpêkê ji xebatên Komîna Film a Rojava ku nîşandanê ji bo zarokan çêbike. Di vî belgefîlmê de hestên zarokan û tevîbûna civakê hat diyar kirin. Herwiha belgefilmê "Darên Bi tenê" yê ku behsa dengbêjan dike, di vî belgefilmî de dengbêjekî kurd, ereb û aşûr cihê xwe têde girtin û şêweyê çanda van hersê netewan hat zelalkirin. Belgefilmê sêyem jî " Evîn Di Riya Qirkirinê de" behsa Êzîdiyan dike him di aliyê dengbêjiyê him jî li ser 74 fermanên ku ser wan re derbas bûne tevî wilo jî jiyan û hezkirina xwe bi riya dengbêjiyê derdixin. Herwiha belgefilmê "Jin War" jî hat pêşkêş kirin, ev belgefilim ji navê xwe died xuyakirin ku behsa gundê jin war dike ku ew jî yek ji destkeftiyên Şoreşa Rojava ye. Bi taybet wek jin bi keda destê xwe ji bo xwe jiyanek û gundekî nû avadikin. Di heman demê de gelek fîlm jî hatine çêkirin ji wan " Berbû, Çîroka Bajarê Wêran bûyî, Kobanê û hwd…"

Astengiya ku me dîtî ji aliyê civakê ve bû, ji ber ku ev kar li ser wan tiştek nû bû. Di heman demê de peydakirina lîstikvanan zehmet bû, dema tevlîbûn û perwerdekirinê xwe dûrî vî karî dixistin. Bi taybet dema destpêkê wek metirsiyekî di dilê wan de hebû, ji ber ku bûyera şewata sînemaya Amûdê ya ku li ser gelê kurd hatî kirin. Ev yek wek aliyekî neyînî di hişê wan de mabû li ser sînema. Ji ber vê yekê gava me ya destpêkê ji bo zarokan bû da ku em aliyê erînî bidin pêş. Di gavên destpêkê de gel xwe nêzî me nedikirin lê gava dîtin ku çawa bi hezarên zarokan bi xwe amade dikin ji bo temaşe kirinê, êdî nêrîna gel jî hat guhertin. Ev gav hat avêtin bi taybet piştî rêzefilmê "Evîna Kurd" ji ber ku piştî ev rêzefilm dîtin ew bixwe dihatin serlêdana me dikirin da ku tevlî lîstikvaniyê bibin û kar bikin. Herwiha filmê "Ji Bo Azadiyê" û yê "Kobanê" jî dengekî mezin da.

-Wek xebatên sînemayê him di milê senaryo, derhênerî û naverokê de heyanî çi astê sînemayê kariye bibe dengê Şoreşê?

Mijarên filmê me çîrokên ku di şoreşê de hatine jiyan kirin, ji ber ku me Komîna Fîlim di nav şert û mercên şoreşê de avakir. Mînak filmê "Evîna Kurd" ya ku li ser aliyek ji jiyanê û destkeftiyên ku di şoreşa Rojava de bûye. Herwiha behsa dema niha dike ku mirov çawa jiyana xwe birêve dibin û çi astengiyan dibînin. Di heman demê de di filmê Kobanê de jî berxwedaniyê dide nîşandan. Bi awayekî giştî em dikarin bêjin ku mijarên me aliyên berxwedanî, welatparêzî, lehengî, civakî, hêvî û serkeftinê di nav sînariyoyên xwe de cih digre. Hewil dide bibe dengê şoreşê, ji ber ku armanca me ya bingehîn ew e ku bibe dengê şoreşê.

-Ji bo kar û xebatên sînema bêtir pêşbikeve û berhemên bi bandor derkevin, pêwîste mirov çawa nêzî vî karî bibe?

Heya ku kar û xebat bêtir pêş bikevin pêwîste nîzîkbûna gel zêdetir bibe, rast e qebûl kirina gel ji bo sînemayê çêbûye, lê heya ku gavên mezintir were avêtin pêwîste zêdetir gel nêz bibin. Heya ku berhemên me yên bi bandor bêtir derkevin pêwîste hezkirin û nêzîkbûna wan ji bo sînema zêdetir bibe. Herwiha pêwîste gel karê sînema ne weke xebatekî normal bibînin. Ji ber ku sînema huner e û huner jî dikare xwe bighîne hemû cîhanê. Sînema karekî dîtbariye bandora wê jî zêdetir e. Em di warê sînema de dixwazin çand, ziman û hebûna xwe avabikin. Di heman demê de em biratiya gelan jî didin pêş û derfetê didin hemû pêkhateyan ku cihê xwe di vî warî de bigrin û belav bibe.

-Di kar û xebatên sînema de heta çi astê jinê kariye cihê xwe tê de bigre û bibandor be?

Jinê gelak astengî dîtin di milê sînema de ji ber ku ev karek nû bû, helbet wê rastî gelak pirsgirêkan were. Lê îro roj jinê çawa karî cihê xwe di hemû qadan de bigre, karî xwe di milê sînema de jî isbat bike. Niha jî jin gavên mezin davêje û di hemû xebatên sînema de cihê xwe digere, him di aliyê lîstikvaniyê de him jî di milê derhênerî, sînariyo, kamîre, mekyaj, cil û bergan de. Herwiha di milê teknîk û deng de jî jinê karî cihê xwe bigre. Karîbû roleke xwe ye bibandor di filam de çêbike. Ji ber ku cihê ku jin lê hebe helbet wê rengê jinê belav bibe li wir, di heman demê de jin dikare bi riya çîrokên xwe rol û hişmendiya jinê biguhere û pêşbixe jî. Sînemaya me ji yên cîhanê cûda ne ji ber ku di sînemayê cîhanê de jinê wek amûreke cinsî di filiman de tê bikaranîn, yan jî wek jineke ku xerabî û fitnê dike tê dîtin. Berhem û filmên me li ser esasê azadiya jinê ne, ji ber ku gava jinek bixwe cihê xwe têde bigre û sînariyokî binvîsîn e, ev yek isbat dike ku jin bi bandorin, bihêzin û xwedî hestin, dikarin jiyana xwe avabikin û di heman demê de hunera xwe jî avadikin.

Dengê Min Tê Te

Sîpan Şînda

Her çend ev demekî direje Kurdistan di bin destê dagirkeran de ye, lê di nava vê sed sala dawî de, Kurd ji aliyê dagirkeran ve bi awayekî hovane hatine tert û belav kirin û li hemî deverên dunyayê mirov dikare li Kurdan biqeside.
Ya rast sergum ji bo Kurdan ne tiştekî nû ye. Piştî ku Osmaniyan Kurdistan dagirkirî, di nava demê de gelek êl û eşîrên Kurdan ji cih û warên xwe hatin sergum kirin û li herêmên ji derveyî Kurdistanê hatin bi cih kirin. Lê piştî di Şerê Cîhanê yê Yekê de welatê Kurdan ji aliyê mêtinger û dagirkeran ve di nava çar dewletan de hatî parve kirin, ev rewş xirabtir bû û sergum ji bo Kurdan êdî bûye weke çarenûsekê. Ev bê çaretiya Kurdan bi taybetî li diasporaya Ewropayê wan têxe di nava liv û kêm be jî, hewl didin ku ji bo çand û zimanê xwe tiştina bikine. Yek ji van çalakiyên wêjeyî jê di navbera 29'ê Gulan û 2'ê Hezîrana 2024'an de li paytexta Elmanya Berlînê ji aliyê çend kesên ku ji wêjeyê hez dikine ve hate lidarxistin. Belê, Yekemîn Festîvala Wêjeya Kurdî li Sergumê: Dengê Min Tê Te pêk hat. Bi rastî festîvaleke gelekî xweş û berketî bû. Gelek bernameyên dewlemend di nava festîvalê de hatin pêşkêş kirin. Festîvalê di 29'ê Gulanê de destpêkir axaftina vekirinê ji aliyê serokê PENa Kurd yê berê Zerdeşt Haco ve hate kirin. Di vekirina festîvalê de Serokê PENa Navnetewî Bûrhan Sonmez yê ku wekî Kurdekî sergum kirî li Birîtanyayê dijî jî amade bû û axaftinek bi sernavê Banga Malê, Banga Zimên kir û li ser girîngiya wêjeyê û bikaranîna zimanê zikmakî li sergumê sekinî.
Akademîsyena Kurd Ozlem Belçim Galip ya ku li Brîtanyayê dijî, li ser têkiliya Huner, Zayend û Penaberî li Diasporayê sekinî. Rojnamevan û Nivîskarê li sergumê Bahroz Bochanî jî tevilî festîvalê bûbû û qala serhatiya xwe ya çûna Avustralyayê, tiştên bi serê wî hatîn û nivîsandina pirtûka xwe ya bi riya Whatsappê li kampeka penaberan de nivîsandî kir. Bê goman çîroka Bahrozî çîrokeke gelekî balkêş û trajîk bû, lê belê ji bo nêzikbûna dewletên rojavayî ya li ser Kurdan baştir bête fêmkirin, diviya bû mirov guhdarî çîroka wî bikira. Ewî serhatiya xwe girêdayî Li Hevgirêka Mêtîngeriyê de Wêje anî ziman û gelek kesên him xwîyanî û him jî bîyanî bi baldar guhdarî çîroka wî kirin. Ji ber ku çîroka wî û tiştên li sergumê hatîn serê wî trajedîyeke mezin bû. Di dawîya roja ewilî de hunermendê Kurd Lawje ji beşdarvanan re stranên xwe yên gelêrî stran.
Festîvalê pênç rojan dewam kir û gelek helbestvan, romannivîs, çîroknivîs û akademîsyenên Kurd yên li diasporayê tevilî bernamê bûn û behsa berhem û serhatîyên xwe kirin. Mînak nivîskarê Kurd Eskerê Boyîk qala serhatiya xwe ya di derbarê Kurdî û Kurdan li Kafkasyayê kir. Dîsa Firat Cewerî behsa serhatîya xwe û li sergumîyê nivîsandina bi Kurdî kir. Bê goman gelek kesên biyanî jî him weke axaftvan û him jî weke beşdarvan tevilî festîvalê bûn û piştigirî dan. Tişteka balkêş ku hêjaye mirov bîne ziman, beşdarvanên bîyanî jî di nav de, piranîya beşdarvanan ciwan bûn. Gelek xort û keçên Kurd yên ku li sergumê hatîne dunyayê tevilî festîvalê bûn. Her çend gelek ji wan bi Kurdî nedizanîn jî, tevilî panêlan dibûn û bi baldarî guhdarî axaftvanan dikirin. Jixwe festîval bi du zimanî bû û wergera Kurdî-Elmanî, Elmanî-Kurdî dihate kirin.
Belê, hêvîdar im ev birêxistînkirinên wêjeyî û rewşenbîrî zêdetir li diasporayê bêne kirin û Kurd di vî warî de li diasporayê çalaktir bin.

Rastiya Rojê li Rojhilatê Asyayê... Beşa (3)

Mistefa Rêzan

Bê guman hemû şaristaniyên mirovatiyê ji hev bi bandor dibe. Ango di şaristiyên destpêkê hata roja me ya îro de dan û stendin di navbera şaristanî û modernînteyên cîhanê ji hev qût nebûne. Lê li parzmîna Asyayê aliyê rûhî yê baweriyan ji gelek deverên cîhanê zêdetir li pêş e.

Baweriya Mîtrayî bi qasî bandora xwe li gelek baweriyên Rojhilata Navîn, Çîn, Hindîstan, heta li Grek û Romayê li parzemîna Ewropayê kiriye. Taybetiya hiştiya ku ev baweriyê bêtir li herêma di navbera çemê Dicle û Firatê de pêş bikeve, her çar werzên sale pir xuya tên dîtin. Bandora rojê li zindîbûna jiyan û li çandiniya ku jêdera sereke a debarê ye heye. Lê belê dema li gelek şûnewarê dîrok lêkolînkirin, derkeve hole bê çiqas mirovên li Rojhllatê cîhanê çiqas daye şopa riya rastî û ronahiyê. Ji lewra roj wek jêdera ronahî û riya heqîqetê tê dîtine.

Ji bo ku ev rastî were fêmkiirn, girîng e mirov çav li çend baweriyên parzemîna Asyayê bigerîne.

1-Bweriya Bodîzmê:

Piştî Kirîstiyan, Îslam û Îndosî baweriya bodîz çaremîn baweriya mezin li cîhanê ye. Hata nêzî 520 miliyon kes baweriya xwe bi bodîzmê tînin. Ev baweriya ji î hêla Gotama Bûda (560-480 BZ) hate avakiirn. Destpêkê li Hindîstan paşê li gelek deverên rojhilatê Asyayê hate belavkirin. Bi tayabetî li Çîn, Japon, Koriya û tîbet belav buye. Gotina Bûda bi zimanê Hindîstanê yê kevin, tê wateya Mirov hişiyar an ronakî. Ji berk u ronahî û enerjiya rojê di vê baweriyê de pir girîng e. Yek ji adetê naskirî di vê baweriyê de, gihiştin lûtkeya konsetrasoyên, ango ponijandina herî bilind, bi nave Nîrvana hatiye naskirin. Mirov ji cîhana madî xwe rizgarkir dike, diponije enerjiya negatîv ji bedena xwe derdixe û enerjiya pozotîv ango erenî ber bi rohaniya bilind ve kom dike. Bi latînî jê re tê gotin Meditation. Paşê werzişa ruh Yoga ji gelek aliyan ve xwe dispêre vê regezê. Li vir ponajindan mirov digihêje lûtkeyê, ji enerjiya dîtina rastiyê di hundirê xwe de hêzeke mezin kom dike, çawa ku roniştiya vê hêzê ji lingê xwe hata serê xwe kom dike vediguheze.

Çawa roj ronahiyê û germahiyê dide derdora xwe, gihiştina Nîrvanayê jî yek ji rêwîtiyê herî zor ên mirovê ku xwe ber bi gihştina rastiyê ve dibe. Bi wateyek din hevsengiya di navbera dil û mejiyê de ava dibe, wekî rojê, ronahî û germahiyê di ruhê xwe de diafrîne. Ev bi xwe jî di nava xwe de gihiştiya rastiya hebûn û jiyanê dihewîne. Eger mirov li perestgehên Budîst li Hîndîstan û Çînê binêre, dibîne ku Bûda bi çarpkî roniştîye, mîna ronahiyê ji bedena wî ber bi rojê ve diçe xuya dike. Ev bawerî bi qasî li ser rêûresmên olî radiweste, ewqasî jî li ser lêgerîna heqîqeta hebûn û enerjiya jê derdikeve radwest e.

2- Baweriya Îndosî:

Ev ol an bawerî bi Brahmayî jî tê naskirin. Siyemîn olên herî mezin ên cîhanê ye. Nêzî 1 milyar û 350 miliyon kes pê bawer dike. Ev ol piranî li Hindîstan, Nêpal û beşekî Indinoziyayê hatiye belavkirin. Li gorî agaiyan ev bawerî ji beriya 1500 B.Z hatiye destpêkirin.

Bawermendên Îndosî bawer dikim ku ruhê mirovan her dimînin û nave Atman lê dikin. Hata ev gotina Avatar ku di medya dijîtal û sektorên sînemayê de hatiye bikaranîn ji gotina Hindî hatiye. Ev gotin tê wateya ku ruhê mirovekî çawa xwe bi rengê cesed an hebûnekê dide temsîl kirine. Îdonsî ji Mîtra û Zeredeştiyê bibandor buye. Ew jî ronahî û enerjiya ruh ya nûnertiya ronahiyê dike pîroz dibînin. Ev ronahî ku wek enerjiya ruh xwe îfade dike, lêgerîna mirovan ya ji bo naskirin bingeha hebûna gerdûn û jiyuanê ye. Bê guman ev baweriyê di sedsalên dawî, ji bo asteke cîhanî bidest bixe hin guhertinan di xwe de afirandiye. Li perestgeha Modorayê xwedayê Rojê Adîtiya heye. Ew di Îndosiyê de xwedayê mezin yê ku derdora xwe 12 xwedayan kom dike. Ev her 12 xweda gerê sale ya rojê temsîl dikin. Navên wan navên rojê ne û parzvanên mehên salê nin. Adîtiya mirovan ji nexweşiyan diparêze. Di nava xwedayên Îndosî xwedayê bi nave Mîtra jî heye.

Her weha Îndosiyan dibîne ku têkiliya di navbera mirov û xweda de, mîna têkiliya di navbera çirûska agir û agir, tov û dare de ye. Li hin pir tên bala her kesekî çima miriyan dişewitînin? Li gorî baweriya Indosî beden ruhê asteng dike piştî mirin, ji lewra dive ruh ji beden azad bibe û ber bi hebûna bilind a li jor ve birêveke. Wê gavê hebûna ruh digihêje lûtkeya bilind ber bi ronahiyê ve. Li vir ev rastî derdikeve hole, ku hemû baweriyên parzemîna Asya derbarê pîroziya rojê de ji hev bi bandor bûne. Heqîqeta ezelî ya ruh bi lêgerîna mirovan ji bo naskirina jiyan û gerdûnê ve girêdayî ye.

3- Baweriya Sîx:

Ev ol wek oleke yekxwedayî xwe dide naskirin. Di sedsala 15'an de li herêma Pencab ya başûrê HIndîstanê destpêdike û li Hindîstanê belav dibe. Li gorî zaravayê Pencabî, gotina Sîx tê wateya Mûrîd, şopdar an şagirt. Rahibên Sîxî şaşik piraniya wan bi rengê reş girêdidin, dire rihê û simbêlên xwe dirêj bikin, pore xwe nequsînin û li binê şaşkê veşêrin. Sofîtî di nava wan de wek rengekî rêûresm û baweriyê tê qebûl kirin. Hin şîrove hene dibêjin bandora tevgerên sofitî ango derwêşî yên li dijî xilafeta Abasî ya Îslamî derketine, li ser baweriya Sîxî hene. Di endaziyariya mîmarî ya Sîxî de, bandor pîroziya rojê tê dîtin. Avaiyên xwe yên pîroz bi qûbeyên bi rengê zêrîn hatine boyaxkirin. Ev qûbe mîna rojê tê diyarkirin. Ji lewra bawermendên Sîx di rêûresmên olî diponijin, li rastiya jiyan, jidayikbûn û mirinê digerin.

Mistefa Rêzan

Rastiya Rojê li Efrîkayê:

Beşa (4)

Parzemîna Efrîqa bû şahid ji gelek ol û baweriyan. Bandor li baweriyên parzemînên din kirin û ji wan jî bi bandor bûn. Ji ber ku ev herêm ji herêmên herî germ di cîhanê de ye, hebûna rojê wek sembol û bawerî pir xwedî wateyek cuda ye. Şaristaniya Misrê û şaristaniya Amazîgiyan şaristaniyên herî navdar li parzemînên Efrîkayê. Ji lewra di neqşên li ser şûnwarên dîrokî de bingha van şaristaniyan hatine nivîsandin. Destpêka ku mirov hewl dide rastiya gerdûna û hebûnê fêm bike. Bawerî li ser bingeha zanîna stêrnasî, werzên sale, jiyan li vê dinya û dinyaya din hatiye avakirin. Di van şûnewaran de diyar dikbe bê çiqas mirovên serdemê pêşî yên van şaristaniyan hewl dane li heqîqeta hebûnê bigerin. Şûnewarên pir bi heybet û mezin ku bi hezarên salan bi tevî hemû rewşên avhawayê yên dijwar ve jî hata îro xwe parastine. Pîramîdên li herêma Cîze ya Misrê mînaka herî ber bi çav e.

1-Li Misrê baweriya rojê:

Gelek şîroveyên li ser nave Amûn Rah ji ku hatiye û çawa tê bilêvkirin hene. Di vê baweriyê de Amûn xwediyê hêza rojê ya ronahî û germahiya ku dide erdê. Hin şîrove dibêje ku gotin Amîn ya di olên yek xweda de bi taybetî di Îslamî de, ji gotina Mirsrî ya kevin Amin hatiye. Ji ber ku roj di jiyana mirovan de pir pîroz, ne dûr e ku ev bi riya Îbraniyan ango qewmê Hz. Mûsa derbasî hemû olên yek xweda bûye. Lê çawa Amûn Rah bû xwedayê herî mezin li tevayî Misrê?

Li gorî agahiyên hatine bidestxistin, dema deshilatdariya xwandana 8. a Frawenên Misrê, hemleyên êrîşê bi ser Sûriyê Nûba û Lîbyayê de kirne û bi serketine, hingî xwedayê herî bi hêz Amûn Rah derketiye. Ji lewra li ser dîwarên pîramîdên Misrê sembolên Roj tîrêjên jê derdikevin hatine nivîsandin. Dîsa çavê xweda Horus ku ronahiya xwe ji rojê digire nişaneya pîroziya vê baweriyê. Rengê zer yê zêr ku mîna rojê ye, li ser hemû dîwarên pîramîdan heye.

Zaniyariyên endaziyarî û arkeoljiyê, dibêjên ev pîramîd ne tenê gorên qiralên Misrê ne. Lê belê ev pîramîd ji bo naskirina her çar werzên sale, şopandina tevgera rojê û stêrên ezmanan hatine bikaranîn. Hata hin zaniyariyên fîzîkê jî, dibêjin ev pîramîd mîna çavkaniya enerjiya ku ji rojê tê kom dike û ji bo hin armancên taybet tê bikar anîn. Pîvanên goşeyên van pîramîdan bi rengekî pir taybet hatine bikaranîn, ew kevirên giran çawa hatine bi cih kirin hata roja me ya îro, zaniyaran matmayî dike. Hêza ronahiyê ya lêgerîna rastiya gerdûnê û hebûnê bi awayekî ku em texmîn nakin li ser vê zemînê hatiye pêşxistin. Mirovên Misirî bi bandora gelek şaristaniyan, bi taybetî şaristaniyên di navbera çemû Firat û Dicleyê de di nava lêgerîna heqîqeta ezlî ya afirandina gerdûn û hebûnê bûne.

Ne şaşe em li vir bêjin, asteke ne kêm ya şaristaniya li Misrê ya têgihiştiya siren xweza û yasayên gerdûnê bûne. Hişmendiya oryantalîst, bi matmayî dibêjin ev asta pêşketina endaziyarî, astronomî û fîzîkî dibe ku bi bandora hin hêzên derveyî erdê ve pêkhatiye. Ji lewra ev nêrîn li hember şaristaniya Misrê neheqiyek mizin. Mînaka herî balkêş ya şopandina Misriyên dema firawenan ji sîstema rojê û endaziyariyê, tê gotin dema peyker û tabûta Ramses di hundirê pîramîdê de hatiye danîn, hesabê dema roja derdikeve û diçe ava tîrêjên, di dema rojbuyîn û roja tacîdarkirina wî de lêdie û ronî dike. Eger ku ev nenaskirina sîstema rojê û endaziyariyê ye ma çiye? Di asteke bilind a zaniyariya fîzîk, astronomî û endaziyariyê heye. Li vir li gor herêmên derdora xwe lêgerîna heqîqetê ku mirovatî ji destpêkê lê digere hata niha, pir bi pêş ve çuye.

Rastiyek din ku mirov ji şaristaniya Misrê fêm dike, ew sembolên çav û rojê li ser dîwarên hundir yên gor û perestgehan pir tên dîtin. Sedema vê, ku roj bi qasî ku germaî û ronahî dide, ewqasî wateya ronahî û enerjiya ruh temsîl dike. Her weha çav ronahiya rojê dibîne û xwe ji taritiyê dûr dixe. Di astekî de buyerên astronomîk û baweriya ruhî ve digihêjin hev. Ji ber vê baweriyê ye, ewqas peyker, perestgeh û pîramîdên pir bi heybet ku mînaka wê li ti dera cîhanê tune ne, hatine avakirin.

2- Bandora rojê li ser Amazîgan:

Dîrokzanan dibêjin dîroka Amazîg hata 1000 B.Z diçe. Li gor zaniyaran, di sala 950 B.Z Fermandarê Amazîgî Şêşenqê Yekemîn bi hêzeke mezin Misrê dagir dike û xanadaneke firawenên Amazîgî tine ser deshildariyê. Hatiye gotin ku xanadana 22 û 23.mîn ên firawenî Amazîgînin. Ji lewra baweriyê olî yên Misirî bi hemû aliyên xwe ve derbasî herêmên Amazîg li tevayî bakurê Efrîkayê dibe. Di wê demê xwedayên Amazîgan wek Atlas Tanîs, Poseydon û Antî ne. Hêjaye goitnê ye ku yek ji wan xwedawendeke jin, ew jî Tanîs e. Ew xwedawenda berhemdarî û zindîbûnê ye. Ew parsevana Qertacê ye.

Heredot û Îbnî Xeldûn gotiye li devera niha Fas û Tûnisî Amazîgiyan îbadeta rojê dikirin. JI ber ku sembola rojê li ser qelek keviran hatiye neqişkirin. Dîsa îfadeyên rojê wek stêr û rojê li ser zend û eniyên jinên bi temen hata niha tê dîtin. Ne şaş e mirov bêje ku baweriya li hebûna rojê wek ronahî, germahî û di hemen demê de lêgerînê rastiya ruh û hebûnê pênase dike.

Her çiqas hemleyên dagirkeriyê bi ser vî gelî de pêkhatine, ji roma, hêzên Îslamî yên Erebî, Fransî û Îtalî ve lê dîsa vî gelî hebûna xwe parastiye. Li hember hemû bişaftin û asimlasyonê li ber xwe daye. Her çiqas bandor zimanên hêzên derve l ser çanda wan buyî jî, lê dîsa zîman, folklore û adetên civakî yên Amazîgiyan hê jî mane. Mirov dikare bêje şibihandinek di navbera Kurd û Amazîgan de heye.

'Armanca dagirkeriya Tirk guhertina demografiya herêmê ye'

Rêvebera Komeleya Mafê Mirovan a kantona Cizîrê Evîn Cumaa diyar kir ku ji destpêka dagirkina Efrînê ve dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê bi hemû kiryarên xwe guhertina demografîk pêk tînin.

Ayşa Silêman/ Qamişlo

Di derbarê kiryarên û sûcên dijmirovî yên dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê li herêmên dagirkirî, rêvebera Komeleya Mafê Mirovan a Cizîrê Evîn Cuma bersiva pirsên Rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:



Ji destpêka dagirkirina Efrînê ve, sûcên dijmirovî li Efrînê tên kirin. Lê li hemberî van sûcan cîhan tev ker, kor û lal e, sedemên vê yekê çi ye?

Li pêş çavê neteweyên Yekbûyî dewleta Tirk a dagirker ragihand ku ew dixwaze herêmeke bi ewle li ser sînor ava bike, da ku koçberên Sûrî yên ku di hundirê Tirkî de bîne wir û bi darê zorê wan li wir bi cih bike. Li ser esasê guhertina demografî ev piroje hat avakirin. Ji ber dewleta Tirk ji destpêka êrişên wê yên li ser Efrînê ji sala 2018'an ve bi hêzeke gelekî mezin hat li ser milet û ev milet jî dest vala bû tiştek çekên giran di destê wan de nebû. Bi darê zorê ew milet ji wir derxist, zêdeyî 500 hezar kes di wir de jiyan dikir. Di dewsa wan de koçberên Sûrî yên di hundirê Tirkiyê de bûn û malbatên çeteyan yê ku şer dikin di wir de bi cih kirin. Milet neçar ma dev ji axa xwe berde ji ber ku hijmarek mezin ji sivîlan hatin hedefgirtin û mal û milkên wan hatin talan kirin. Di herêmê de serê sedî 95 kurd têde dijiyan, lê niha serê sedî 20 kurd li wir mane. Herwiha piştî ku şer rawestiya kesê ku xwest vegerin ser axa xwe rastî işkence û girtinê dihatin, ew kesê girtî bernedidan heya kuqaseyek pir ji pereyan nedin. Di heman demê de dest tavêtin jin û keçên welatiyan, dest danîn li ser milkên wan wek zevî, mal û darên wan. Her wiha xaniyên ku li ser navê jinan ban yan jî jin bi tena xwe tê de jiyan dikir, yekser dest danîn li ser wan milkan, heman tişt li Serêkaniyê û Girêsipî jî bikar anîn. Heya niha jî bi riya balefirên bê mirov êrişên xwe berdewam dike. Di encama van êrişan de gelek sivîl jî şehîd dikevin, di heman demê de di meha gulanê de li ser herêma Cizîrê sê carî êriş kir. Ev êriş jî li ser erebeyên hin kesên rêveber bûn. Her wiha heyva sor jî kirin armanca xwe. Sînor ji van êrişan re nîne, derdê wan guhertina demografiyî ye di herêmê de, ji ber vê yekê bi hemû awayan hewil didin vê guhertinê pêk bînin. Tu rêzgirtinê ne ji zagonên navneteweyî re digrin ne jî ji hebûna sivîlan re nakin.

Ji bona ku guhertina demografîk û kiryarên dagirkeriyê li herêmên dagirkirî bi taybet li Efrînê bidawî bibin pêwîste çi were kirin?

Belgekirina van kiriyaran tiştekî gelekî girîng e, da ku bi riya van belgeyan dengê vî gelî bighîne Netewên Yekbûyî, cihên eleqdar û komeleyên mafên mirovan. Heger em xwe neparêzin û dengê xwe bilind nekin tu kes li me guhdar nake. Pêwîste milet dengê xwe bighîne bi riya zagon û belgeyan re, daxwaza mafê xwe bike li pêşiya dadgehên Navneteweyî, wê demê ew ê neçar bibin li me guhdar bikin û hisab ji dijmin bixwazin.

Heya niha hûn wek saziya mafê mirovan we çiqasî rapor di derbarê van sûcan de amade kirine û we radestî kî kirin, li hemberî wê we tu bersiv girtin yan na û da ku ev rapor bi encam bibin pêwîste çi were kirin?

Gelek rapor di vî derbarî de hatin çêkirin, di heman demê de raporên sala ne hene, ew rapor nirxandina rewşa salekiye. Herwiha belge rojane tên çêkirin li ser êrişên ku tên kirin li ser herêmê. Bi riya qomîtên lêkolînê yên ku girêdayî Netewên Yekbûyî ku sûcên di Sûriyê de tê kirin belge dikin, em bi riya wan dengê gel û êşa wan dighînin vê qomîtê. Her wiha rapora ku ji cem vê qomîtê derdikevî diçe pêşiya encûmena ewlekariyê û di wir de tê xwiyanî kirin ku çiqasî binpêkirina mafê mirovan, binpêkirina zagonên navneteweyî tê kirin ji aliyê dewleta Tirk û komên çeteyên girêdayî wê ve. Di wirde jî zextek li ser dewleta Tirka dagirker çêdibe ji bo rawestandina êrişan, lê mixabin gelek dewlet da ku bercewendiyên xwe bi Tirkiyê re xira nekin, gelek zextê lê nakin. Lê pêwîste milet ji doza xwe venegere û herdem li mafê xwe xwedî derkeve ev yek jî dibe alîkar ku zext were kirin li ser dewleta Tirk.

Çalakiya Dîlên Azadiyê bi biryardariyeke mezin berdewam e

Navenda Nûçeyan

Çalakiya girtiyên azadiyên yên di girtîgehên Bakurê Kurdistan û Tirkiyê de ya boykotkirina hevdîtinên ser telefonê û derketina dadgehê di roja 196'an de bi biryardariyeke mezin didome.

Girtiyên azadiyê yên li girtîgehên Bakurê Kurdistanê û Tirkiyeyê di çarçoveya kampanyaya navneteweyî ya "Ji Abdullah Ocalan re azadî, ji bo pirsgirêka Kurd re çareseriya demokratîk" de, di 27'ê Mijdara 2023'yan de dest bi greva birçîbûnê ya bêdem û dorveger kiribûn. Girtiyan destnîşan kiribûn ku heke heta 15'ê Sibatê roja komploya navneteweyî ya li dijî Rêber Abdullah Ocalan daxwaza wan neyên qebûlkirin, dê çalakiya xwe derbasî qonaxeke nû bikin.

Girtiyên siyasî piştre di 12'ê sibatê de bi daxuyaniyekê ragihandin ku ji bo çalakiya wan bandorê li xebatên hilbijartinê neke, biryar dan ku dê piştî hilbijartinê çalakiya xwe derbasî qonaxeke nû bikin. Girtiyên PKK û PAJK'ê di 3'yê nîsanê de bi ser navê Denîz Kaya daxuyaniyek weşandin û ragihandin ku ew bi boneya 4'ê Nîsanê Roja jidayikbûna Rêber Abdullah Ocalan, çalakiya xwe ya greva birçîbûnê bi dawî dikin û çalakiya xwe derbasî qonaxeke nû dikin.

Girtiyan di daxuyaniya xwe de wiha gotin: "Em çalakiya xwe ya greva birçîbûnê ya dorveger a ku me heta niha dimeşand, di 4'ê Nîsana 2024'an de bi dawî dikin, rojbûna 75'an a Rêberê xwe, lehengiya kedê ya mezin bi hezkirin û dilsoziyeke mezin silav dikin, 4'ê Nîsanê ku rojbûna azade di serî de li Rêber Apo li şehîdên têkoşîna azadiyê, li gerîlayên bi fedaî şer dikin, li gelê me û gelan pîroz dikin. Em dixwazin ragihînin ku emê pêngava xwe ya 'Azadî ji Rêber Apo re, çareseriya demokratîk ji pirsgirêka Kurd re' ji 4'ê Nîsanê û pê ve bi dirûşma 'Jiyana bi Rêberê xwe re ya di heman şertî de' bi boykotkirina dadgeh, serdana malbatê û axaftina bi telefonê bimeşînin."

Çalakiya girtiyên siyasî ya bi daxwaza azadiya Rêber Ocalan û çareserkirina pirsgirêka ku di 27'ê Mijdara 2023'yan de bi greva birçîbûnê ya bêdem û dorveger hatibû destpêkirin, di roja 195'an de bi qonaxeke nû, bi çalakiya boykotkirina hevdîtinên ser telefonê, malbatan û dadgehê didome.

Ev çalakî yek ji çalakiyên ku di çarçoveya Pênagava Cîhanî ya azadiya Rêber Apo de ku di 10'ê Cotmeha 2023'an de li 74 navendên Cîhanî hatibû li dar xistin û li tevahiya cîhanê belav bû. Di vê bêngavê de li ser asta cîhanê Feylezof, zaniyar, nivîskar û rojnamevan û gelek kesayetên serbixwe tevlî wê bûn. Di heman demê de bi milyonan kurd li her çar perçeyên Kurdistanê û Cîhanê bi çalakiyên cûda banga azadiya fîzîkî ya Rêber Apo dikin û tevlîbûna xwe ji pêngavê re radighînin.

Pergala Îmraliyê...(1)

Rêberê Gelan Abdullah Ocalan derbarê Îmraliyê de wiha dibêje: “Girtîgeha Îmraliyê ji pergala girtîgehên li Tirkiyeyê gelekî cûda ye. Rewşa li hemû girtÎgehên din heyî li vir derbas nabe. Rewş û avahiya vê derê bi peymaneke veşartî hatiye avakirin. Amerîkayê girtîgehên bi vî rengî bi peymanê veşartî li gelek deverên din jî dan çêkirin. Girtîgeha Îmraliyê jî bi alîkariya Amerîka û Tirkiyeyê bi hev re bi awayekî veşartî amade kirin.”

Amara Baran / Qamişlo

Girtîgeha Girava Îmraliyê cara yekem di 11’ê Tebaxa 1935’an de ket meriyetê. Dema yekem car hate vekirin, ji ber erda çandiniyê ya li giravê, armanc ew bû ku girtî bi çandiniyê re mijûl bibin. Mêvanên ewil ên girtîgeha girava ku rûbera wê 10 kîlometre çargoşe ye, 50 mehkûmên ku ji ber sûcê kuştinê li girtîgehên Stenbol û Bursayê hatibûn cezakirin, bûn. Li giravê ji bilî serokwezîrê berê Adnan Menderes û wezîr Fatîn Rûştû Zorlu û Hasan Polatkan, Yılmaz Güney, Wênesaz Îbrahîm Balaban û Wênesazê Yewnanî Angulos Stafonodis jî li giravê man. Girtîgeha Îmraliyê ya ku 25 sal in Rêber Abdullah Ocalan lê tê ragirtin, her çendî bi Girtîgeha Guantanamoyê re dişibin hev jî li cîhanê mînakek wî tûne.

Di sala 1998’an de dema ku Rêber Abdullah Ocalan di encama komploya ku ji Sûriyeyê hate derxistin, pêngava yekemîn a planên destwerdana hêzên navneteweyî ya li Rojhilata Navîn destpê kir. Piştî ku gelek welatan deriyên xwe girtin, Ocalan di 15’ê Sibata 1999’an de radestî Tirkiyeyê hat kirin. Piştî ku Ocalan anîn Tirkiyeyê, girtîgeha li Girava Îmraliyê bi lez û bez hat valakirin û birin vir. Navê girtîgeha nîvvekirî ya ku girtiyên edlî tê de hene, weke Girtîgeha Tîpa F a Ewlehiya Bilind a Îmraliyê hate guhertin.

Ji kinîseyê (dêr) girtîgeh hat avakirin

Li girava Îmraliyê dîwarên dêra ku hatiye rûxandin ji aliyê mamosteyê mehkûm Fehrî yê înşaetê ve hat tamîrkirin û girtîgehek hat çêkirin. Girtiyên ewil anîn Îmraliyê yên li girtîgehên parêzgehên derdorê bi sûcê kuştinê hatin girtin. Di sala 1999an de dema girav hat valakirin, 247 girtî hebûn. Serdozger Cemîl Kuyu der barê girava Îmraliyê de ev tişt anîbû ziman: “Piştî lêkolînên destpêkê di sala 1934’an de, di sala 1935’an de li Girava Îmraliyê girtîgehek hat avakirin. “Ev girava mîna bihuştê, bi tava xwe ya geş, bi deryaya zelal, bi rojavabûnên xwe yên bêhempa, bi daristanên çamê yên ku ber bi peravên xwe ve dirêj dibin, bi benderên xwe yên bêdeng, kêvroşkên kovî, û baxçeyên cûrbecûr û masiyên xwe, dihat zanîn, mixabin niha wekî girtîgehek ku salane bi darvekirinan tê zanîn û tê bikar anîn”.

Girtîgeh di sala 1999’an de wek “xeta sor” hat pênasekirin

Abdullah Ocalan di 15’ê Sibata 1999’an de radestî Tirkiyeyê hat kirin û Girava Îmraliyê ya ku lê bi cih bûbû weke “herêma ewlekariya taybet” û “xeta sor” hat îlankirin. Li Girtîgeha Îmraliyê 1 rêveber û 3 alîkar bi giştî 34 gardiyanên ewlekariya hundirîn; Bi giştî 700 leşkerên taybet ji ewlehiya derve ya girtîgehê berpirsyar in. Li gel ku destûr nayê dayîn keştiyên sivîl ji 3 kîlometreyan zêdetir nêzî giravê bibin, helîkopterên sivîl nikarin di ser giravê re derbas bibin. 24 seat bi 55 qamereyan têne şopandin herwiha bi têlên elektronîk jî derdora girevê dorpêç kirine.

Dîroka sedsala de gireva Îmraliyê

Dîroka sed salên dawî ya girava Îmraliyê dîrokeke tijî êş, rondik, sirgûn û darvekirin e. Ji ber vê yekê ev girava ku quncikekî bihuştê bû, ji tirs, fikar, zilm, û îşkenceyê veguherî dojeheke tarî. Îro jî dixwazin Rêberê gelê kurd Abdullah Ocelan di nav vî tarîtiyê de bigrin. Di nava kesên ku beriya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan anîn Îmraliyê, Serokwezîrê wê demê Adnan Menderes ê ku derbeya 1961’ê bû û du wezîrên wî jî hene. Adnan Menderes, Hasan Polatkan û Fatîn Rûştû Zorlu piştî li Girava Yasayî hatin darizandin anîn Îmraliyê û piştî demekê li wir hatin înfazkirin. Ji xeynî van yek ji kesên ku hatiye giravê jî Yilmaz Guney e ku bi nasnameya xwe ya kurd û muxalîf derdikeve pêş. Ji xeynî van, nivîskar Rıfat Ilgaz, Îbrahîm Balaban, wênesazê Yewnanî Angulos Stafonodis û bi dehan kesên din ên navdar di vê zindana giravê de man. Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan têkildarî nasnameya kesên li vir mane jî ev tişt anî ziman: “Weke hûn jî dizanin Îmraliyê taybetmendiyên xwe hene. Diyar e kî li vir dimîne. Ji Bîzansê heta niha ev yek bûye. Dijberên herî bilind ên dewletê li vir man. Serokwezîr û dewlet ji vir derbas bûn. Rifat Ilgaz, ji bo şert û mercên giran ên girtîgehê vegot, diyar kir ku mirov ji du salan zêdetir nikare li vir bijî û wê carek din serwext nebe.Piştre rewşa girtîgeha li girava Îmraliyê hat guhertin û veguherî girtîgeheke nîvvekirî. Rewşa giravê heta sala 1999’an bi komploya ku Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan hate



girtin hat guhertin.

Li cîhanê mînaka wî tûneye

Dema ku Girtîgeha Îmraliyê li gorî têgihiştina Amerîkayê ya li ser Guantanamoyê hat nûkirin, her çendî li Girtîgeha Îmraliyê muqayese bikin jî şert û mercên Girtîgeha Îmraliyê dijwartir in. Li Guantanamoyê ku li Guantanamoyê pêşwazîkirina malbat, parêzer û ziyaretvanan û amûrên ragihandinê yên wek telefon, name, faks û telegram qedexe ne, di pergala Girtîgeha Îmraliyê de yek ji van mafan nayê qebûlkirin. Her çend di hin aliyan de wekhevî hebin jî, li cîhanê mînaka Girtîgeha Îmraliyê nîne.

Gireva Îmraliyê bi sîstema” sê ling” tê rêvebirin

Di hin hevdîtinên berê de, Rêber Abdullah Ocalan der barê Girtîgeha Îmraliyê de gelek nirxandin kirin. Abdullah Ocalan; Wî destnîşan kir ku bi sîstema “sê ling” tê birêvebirin, lingekî wê DYA ye, lingekî wê Ewropa ye û lingê din jî Tirkiye ye. Tesbîtên Abdullah Ocalan ên der barê Îmraliyê de wiha ne: “Girtîgeha Îmraliyê ji pergala girtîgehê ya li Tirkiyeyê gelekî cuda ye. Rewşa girtîgehên din li vir derbas nabe. Rewş û avahiya vê derê bi peymaneke veşartî hatiye avakirin. Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê bi peymanên veşartî li gelek cihan gelek girtîgehên bi vî rengî ava kirin. Girtîgeha Îmraliyê yek ji girtîgehên taybet e ku ji aliyê DYA ve bi peymaneke veşartî hatiye avakirin. Di dema vê yekê de nêrîn û erêkirina YE’yê hate girtin û diyar kirin ku divê avahî û mercên vê derê çawa be. Divê Komîteya Pêşîgirtina li Îşkenceyê ya Ewropayê (CPT) weke karekî nebaş neyê dîtin, weke heyeteke dem bi dem tê û diçe neyê dîtin, haya wan ji tiştên li vir heye. Ew saziyek girêdayî Komîteya Ewropî ye, ji ber vê yekê Encûmena Ewropî bi tevahî jî xwedî agahdarî ye. Dibêjin navenda krîzê ya girêdayî Serokwezîrtiyê vê derê îdare dike, lê ne wisa ye, ev der rasterast girêdayî DYA yê ye. Ji destpêkê ve min fêhm nedikir ku çima qaîdeyên girtîgehê jî, nehatine bicihanîn. Lê derket holê ku Girtîgeha Îmraliyê yekemîn girtîgeha Guantanamoyê ye. Ji pêkanînên ku li vir li min tên sepandin ders tên girtin. “Ew dipîvin ka miriv çiqasî li hember zordestiyê dikare li ber xwe bide.”

Li Îmraliyê 6 rojan jiyankirin zehmete

Abdullah Ocalan diyar kir ku di şert û mercên Girtîgeha Îmraliyê ya ‘taybet’ de jî 6 rojan tu kes nikare bijî û got, “Ez girtiyê herî giran ê cîhanê me, Rojava jî di nav wan de ye. Sîstema cîhana kapîtalîst ez dîl girtim. Dewlet min wek qertafekî, wek rehîn digre. Ez li vir rehînekî siyasî me. Divê helwesta min bi vî awayî bê zanîn. Ez dikarim vê yekê bi analojiyek rave bikim: Ez mîna yekî me ku bi hewavanek ve girêdayî ye, ew kengê bixwazin dikarin wê jêkin. Jixwe girankirina rewşa tecrîdê tê wateya darvekirinê. “Di bin van şert û mercan de 6 rojan li girevê jiyankirin zehmete.

Cara yekem Tecrîd bi fanoseke destpêkir

Tecrîda li ser Abdullah Ocalan cara ewil bi “fanoseke” anîn salona dadgehê destpê kir. Serlêdana camê ku dihat gotin bi hinceta ‘ewlehiya jiyanê’ hatiye kirin, pêngava yekemîn a tecrîda li ser Abdullah Ocalan a salên piştre bû. Pêngava din a piştî tecrîda ku bi fanosa cam dest pê kir, pêvajoya bi tenê hiştina li Girtîgeha Îmraliyê, di bin çavdêriya 1000 kesên ku hemû bi taybet perwerde bûne, bû. Abdullah Ocalan ku heta sala 2009’an bi tenê ma, di vê heyamê de destûr hat dayîn ku bi parêzer û malbata xwe re hevdîtinê pêk bîne, lê tu girtiyek din nedidan cem wî. Tecrîda li ser Abdullah Ocalan ku bi rakirina cezayê darvekirinê û veguhertina cezayê heta hetayê mafê wî yê hêviyê hate rakirin, roj bi roj zêde bû.

Di sala 2007’an de li gireva Îmraliyê jehirîkirina Rêber Abdullah Ocelan pêk hat

Di sala 2007’an de serdana çaremîn a CPT’ê bi hewldanên dewletê yên ji bo jehrîkirina Ocalan pêk hat. Parêzeran di 1’ê Adara 2007’an de li Romayê civîneke çapemeniyê li dar xistin; Wan diyar kirin ku wan nimûneya porê ku ji Abdullah Ocalan girtine di laboratuarekê de lêkolîn kirine û di encamê de dozên bilind ên kîmyewî di laşe Abdullah Ocalan de hatine dîtin; Diyar kir ku stonîyûm û kronîm hatin dîtin, ev tê wateya jehrîkirina bi rêkûpêk û sîstematîk rêveberiya CPT’ê biryar da ku heyetekê bişîne Îmraliyê. Heyeta ku ji Alîkarê Sekreterê CPT Fabrice Kellens û Midûrê Saziya Tipa Edlî ya Zanîngeha Cenevreyê û pisporê derûnnas Tîmothy Hardîng pêk tê, di navbera 19-22’ê Gulana 2007’an de çûbûn Îmraliyê. Heyeta CPT’ê di rapora ku salek piştî vê serdanê hat weşandin de, têkildarî têkiliya Ocalan a bi cîhana derve re û lênihêrîna tenduristiyê de gelek pêşniyar hatin kirin.

‘Bi tevlîbûna hilbijartinan em ê destkeftiyên şoreşê biparêzin’

Bi rêya hilbijartinan hêza gelê kurd li ser erdê hate xuyanîkirin her wiha beşdarbûna hemwelatiyan di hilbijartinan de bi rengekî demokrasî xurtbûna îradeya gelê herêmê tê nîşandan.

Lîloz Hisên/Qamişlo

Rêveberiya Xweseriya Demokratîk amadekirina hilbijartinên navxweyî ku di 11`ê Gulanê wê li Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê were destpêkirin, ev hilbijartin ya yekemîne piştî erêkirina ser hevpeymana civakî ya nû, ji bo hilbijartina serokatiya 121 şaredariyan li ser asta 7 kantonan, 25 partî û rêxistinên jinan beşdarî hilbijartinan bûn û ji mafê her hemwelatiyekî ye ku di herêmê de jiyan dike tevlî hilbijartinan bibe û dengdanê bide bi rengekî demokraqsî.

Derbarê mijara hilbijartinan, rewşenbîr û nivîskarên kantona Cizîrê beşdarbûna bi rengê demokrasî di hilbijartinan de û giringiya wê ji me re anîn ziman. Endamê Desteya Rêveber a Yekîtiya Rewşenbîrên Rojavayê Kurdistanê Mistefa Ebdo da zanîn ku li Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê yekem car piştî şoreşa Sûriyeyê hilbijartin pêk tên û bi rengekî demokrasî 25 partî û rêxsitinên jin beşdarî hilbijartinan bûn, her wiha ji mafê 31 milyon kesî ye ku tevlî dengdanê bibin di nav de jî penaberên li Herêma Rêvebriya Xweser jiyan dikin.

Mustefa Ebdo wiha diyar kir:” Ev hilbijartin giringiyeke wê heye ji bo birêxistinkirina jiyana xizmetguzarî û rêveberiya herêmê, her wiha demokrasîbûna hilbijartinan tekezî dike di derbarê nêzîkatiya Rêveberiya Xweseriya Demokratîk

Mustefa Ebdo

li ser yekrêziya herêmên Sûriyê û serweriya dewleta Sûriyê, hevgirtin û aramiyê li Sûriyê zêde dike.”

Mustefa Ebdo destnîşan kir ku li dar xistina hilbijartinan de rewşeke asayî ye ji bo başkirina rewşa civakê ji tevahî aliyan ve, her wiha bang li gel û pêkhateyên herêmê kir ku ji bo serkeftina hilbijartinan bixebitin.

Mustefa Ebdo wiha got: “ Rêveberiya Xweseriya Demokratîk her tim siyaseteke nîştimanî ya demokratîk li Sûriyê dimeşîne û yekrêziya xaka Sûriyê parastiye, ji bo dîtina çareseriyên berfireh ji pirsgirêka Sûriyeyê û bihêzkirina demokrasiyê li herêmê di xebatan de berdewam e.”

Mustefa Ebdo wiha anî ser ziman:” Hilbijartinên şaredariyan li Bakur û Rojhilatê Sûriyê pêngaveke erênî û pêşeng e ji bo demokrasiyê û nûnertiya wê li ser erdê. Hemwelatiyên Sûriyeyê ji destpêka şoreşa Sûriyeyê ve ji sala 2011`an de ji mafê xwe yê hilbijartinê û namzetiyê bêpar mabûn, bi taybet li Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê û herêmên ji aliyê dewleta Tirk a dagirker ve hatine dagirkirin.”

Anahîta Sîno

Mustefa Ebdo piştrast kir ku tevî hemû şert û mercan pêkhateyên herêmê dê hewl bidin ku tecrûbeya xwe ya demokratîk pêş bixin, her dem wê îradeya gel bi ser bikeve bi hevgirtin û biratiya gelan.

Mustefa Ebdo wiha berdewam kir:”Di nava van hemwelatiyan de, çi jin û çi mêr, di tevlîbûna hilbijartinan de hestê dilxweşiyê bi wan re çêdibe ku li hember van hilbijartinan xwedî maf û erk in, her wiha di wê baweriyê de ne ku berpirsyartiya pêşketina civakê û hilbijartina namzetê rast ketiye ser milê wan da ku ev namzet nûnertiya civakê bike, ji ber vê yekê em dibînin ku gel li qadanin û bi hêzeke mezin kar û xebatan dikin.”

Mustefa Ebdo di dawî de wiha got:” Divê ev hilbijartin ne tenê li ser asta Sûriyê, lê li ser asta Rojhilata Navîn û cîhanê denge vede, da ku her kes bibîne ku gelê Sûriyê bi giştî û gelên Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi taybetî, dikarin her karekî bikin û bi serê xwe û bi keda zarokên xwe, xwe bi rê ve bibin.

Ji milekî din ve jî Anahîta Sîno Hevseroka Yekîtiya Rewşenbîran

ya kantona Cizîrê axivî û tekez kir ku hêza gelê kurd di riya hilbijratinan de û li ser erdê xurt dibe, hilbijartinên ku li Rojavayê Kurdistanê bi rengê demokratîk pêk tê, Îradeya gel nîşan dide, gel hemû li ser sendoqên dengdanê ne, her kes kar û xebat dike da ku namzetên xwe bi rengekî demukratîk hilbijêrin ku karibe xizmeta civakê bike.

Anahîta Sîno wiha di gotinên xwe de diyar kir: “ Li dar xistina hilbijartinan tê wateya ku îradeya gelê herêmê pir xurte û baş hatine rêxistin kirin, demokratiya ku îro li ser vê xakê tê meşandin bi rengekî adil e, berovajî dema rêjîmê de ku hilbijartin ne ji mafê her kesî bû. Em ê di malên xwe de rûnenên û bi dengdanê em ê destkeftiyên şoreşê biparêzin.”

Anahîta Sîno got:” Beşdarbûna gel di hilbijartinan de erkeke nîştimanî û mafê her welatiyekî ye, ku pêwîstî bi beşdariya hemû kesan heye, weke tekezî li ser pabendbûna bi helwestên demokratîk û dilgiraniya ji bo peydakirina cihê beşdariya gel di biryardanê de.”

Anahîta Sîno wiha anî ziman:”Ev hilbijartin ne tenê di warê gotinê de, lê di kiryarê de guhertineke kalîteyî di demokrasiyê de pêk tîne û erkek netewî, mirovî û exlaqî dikeve ser milê gel, ku di qonaxa bê de kî nûnertiya xwe bike, xizmeta gel û welat bike, em hemû hêvî dikin ku bibe qonaxeke aştî û avakirin û aramiyê.

Anahîta Sîno tekezî kir li ser girîngiya dengdanê û tevlîbûna hilbijartinan di guhertina çarenivîsa gel de.

Di dawî de Anahîta Sîno wiha anî ziman:”Giringiya beşdariya di hilbijartinan de tê wê wateyê ku hemwelatî bi girîngiya rol û pabendbûna xwe bi proseya hilbijartinan re bizane, û bizanibe kîjan namzet ji bo wî baştir e. Nemaze beşdarbûna di hilbijartinan de tê wateya hestê namzet û dengdêran bi rengekî berpirsyar li beramberî civakê.

‘Bi bilindkirina asta berxwedanê wê êrîş têk biçin’

Jîn Hisên/Qamişlo

Hevseroka Tevgera Civaka Demokratîk (TEV-DEM) Rûken Ehmed bang li tevahî gelên herêmê kir ku bi yek helwest, bi sekn û hevgirtineke xurt li hemberî êrîşên dagirkeriya Tirk berxwedanê bighînin lûtkeyê.

Êrişên dewleta Tirk a dagirker yên li dijî gelên herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê bênavber dewam dike. Herî dawî dagirkeriya Tirk bi riya balafirên bêmirov mal û erebeyên sivîlan li Til Hemîs, Amûdê û Qamişlo hedefgirt .

Derbarê mijarê hevseroka Tevgera Civaka Demokratîk TEV-DEM Rûken Ehmed ji rojnameya me re axivî.

Rûken Ehmed diyar kir ku bi armanca têkbirina vîna gelan, dewleta Tirk a dagirker çareke din li dijî herêmê êriş pêk anîn û wiha domand: “Dagirkeriya Tirk di êrişên xwe de welatiyan û cihê xizmetguzariyê dike armanc. Piştê wê jî gefên dagirkeriyê berdewam in. Ji xwe êrişên dagirkeriyê bê navber dewam dike, vê carê jî li dijî îradeya gelan ya pêkanîna hilbijartinên şaredariyan, helwsta xwe eşkere dike û dibêje ew ê îradeya gelan qebûl neke.”

‘Divê saziyên mafên mirovan berpirsyartiyên xwe bi cih bînin’

Rûken Ehmed wiha domand: “Divê saziyên mafên mirovan û bi taybet saziyên tenduristiyê yên navneteweyî li hember êrîşên li dijî welatiyan û armancgirtina akîpên Heyva Sor A Kurd bêdeng nemînin. Herwiha pêwîste saziyên navneteweyî bi erkê xwe yê exlaqî rabin û berpirsyartiya xwe bi cih bînin. Ji ber ku êrişên dagirkeriya Tirk bi awayekî rasterast civakê dike armanc.”

‘Ji bo rawestandina êrîşan pêwîste asta berxwedanê bilinditir be’

Rûken Ehmed bal kişand ser kiryarên dagirkeriya Tirk û wiha got: “Li dijî êrîşên li ser herêmê gel daketin qadan, saziyên hiqûqî û tenduristî daxuyanî dan û çalakî li dar xistin, lê divê tevahî gelê herêmê asta berxwedanê bilindtir bikin, bi hevgirtineke xurt destkeftiyên herêmê biparêzin, herwiha pêwêste jin û ciwanên ku li Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê jiyan dikin xwedî helwest û sekneke xurt bin, divê em bizanibin ku şerekî taybet li dijî sîstema Rêveberiya Xweser li herêma Bakur û Rojhialtê Sûriyê ku bi awayekî demokratîk tevahiya gelan di bin sîwana wê de jiyan dikin.”

Hevseroka Tevgera Civaka Demokratîk TEV-DEM Rûken Ehmed axaftina xwe wiha qedand: “Li hemberî êriş û planên dewleta Tik a dagirker divê gel şiyar bû amade be. Herweiha bi hêzeke mezin vîna xwe nîşan bide. Ji bo hilbijartinan divê kar û xebat bê kirin ji ber ku ev mafê civakê ye ku biçin ser sendûqan û namzetên xwe hilbijêrin da ku em bibin bersivek ji vê qûnaxa çaresnûsê, sîstema xwe bidin rûniştandin, divê gelê me bi hêzeke mezin bizanibe ku ev hilbijartin wateyeke wê ya giring heye û di riya berxwedan û têkoşînê êrîşan vala derxînin.”